# Bultena heftane

# 29/3/2024

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

# TJK-E kampanyaya bi nave 'Hezar Jin Yek Deng' da destpêkirin

TJK-E, di çarçoveya pêngava "Ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re azadî û ji pirsgirêka Kurd re çareserî" de kampanyayek bi navê "Hezar Jin Yek Deng" da destpêkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/tjk-e-kampanyaya-bi-nave-hezar-jin-yek-deng-da-destpekirin-44739

Çavkanî:JINHA



Rojhilata navîn

## Jinên Colemêrgê: Dê serkeftin a me be

Li Colemêrga ku bi hezaran hilbijêran ji derve anîne lê bi cih kirine, gel bi biryar e tevî hîleyan jî bi ser bikeve. Jinên Colemêrgê bi gotinên; "Dê serkeftin a me be" diyar kirin ku ew ê qeyûman ji bajar û navçeyên xwe bişînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-colemerge-de-serkeftin-a-me-be-44576

Çavkanî:JINHA



## Qutbûna pêwendiyê li Sûdanê rê li ber gihîştina alîkariyê digre

Ji ber pevçûnên berdewam li Sûdanê qutbûna pêwendiyê bandoreke neyînî li gihîştina alîkariyan û jiyana karsaziyê dike û her wiha dibe sedem ku malbatên li heremên cuda dijîn agahî ji hev negirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/qutbuna-pewendiye-li-sudane-re-li-ber-gihistina-alikariye-digre-44577

Çavkanî:JINHA



## [Safînaz Allouh: Rojnamevanên jin ên li Xezayê rastiyê radigihînin]

Endama Komîteya Jinan a Sendîkaya Rojnamegeran Safînaz Allûh diyar kir ku kampanyaya "Bûyîna Rojnamegera Filistînî" ya ku ji bo hevgirtinê li Xezayê dane destpêkirin berdewam dike û rojnamegerên jin ragihandina heqîqetê didomînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/safinaz-allouh-rojnamevanen-jin-en-li-xezaye-rastiye-radiginin-44580

Çavkanî:JINHA




## [Li Boulaq Al-Dakrourê li dijî tundiya li ser jinê xebatên hişyariyê tê meşandin]

Jinên li taxa Boulaq Al-Dakrour a bajarê Gîza yê Misirê dijîn, di warê perwerde, îstîhdam û her aliyê jiyanê de rastî şîdet û cudakariyê tên. Ev yek jî dibe sedem ku di gelek waran de mafên wan werin binpêkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-boulaq-al-dakroure-li-diji-tundiya-li-ser-jine-xebaten-hisyariye-te-mesandin-44591

Çavkanî:JINHA



## Psîkoterapîst Ramia Al Jurdî: Muzîk ji bo gelek nexweşiyan dibe derman

Psîkoterapîst Ramia Al Jurdî diyar kir ku rêbazên psîkoterapîst xwe dispêrin demên berê, da zanîn ku yek ji van rêbazan muzîk e û bandoreke wê ya başkirina gelek nêzîkatiyên neyînî li ser zarokan û kesên mezin çêdike.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/psikoterapist-ramia-al-jurdi-muzik-ji-bo-gelek-nexwesiyan-dibe-derman-44593

Çavkanî:JINHA




## ‘Ji mirina Sara Tebrîzî dewleta Îranê berpirsyar e'

Jinên girtî têkildarî mirina girtiya siyasî ya berê ku piştî hat binçavkirin bi awayekî bi guan jiyana xwe ji dest da daxuyanî dan û gotin: “Ger Sara li welatekî azad bijiya dê mirina wê ewqas bi êş nebûya.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-mirina-sara-tebrizi-dewleta-Irane-berpirsyar-e-44597

Çavkanî:JINHA



## [Emîn Çelîk ê ku ji bo deng nede DEM Partiyê gef lê dihat xwarin hat qetilkirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/emin-Celik-e-ku-ji-bo-deng-nede-dem-partiye-gef-le-dihat-xwarin-hat-qetilkirin-44598)

Berpirsê DEM Partiyê dibistana li gundê Çirmik ê girêdayî Amedê Emîn Çelîk ji bo deng nede bi mirinê gef lê hat xwarin ji aliyê AKP'yiyan ve hate qetilkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/emin-Celik-e-ku-ji-bo-deng-nede-dem-partiye-gef-le-dihat-xwarin-hat-qetilkirin-44598

Çavkanî:JINHA



## [Çeteyekî ku li Babê êrişa zayendî li jinekê kir reviya Tirkiyeyê](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-bab-a-dagirkiri-ceteye-erisa-zayendi-li-jineke-kir-reviya-tirkiyeye-44600)

Li bajarê Babê ya ji aliyê dewleta Tirk ve hatî dagirkirin, çeteyek yê koma Ehrar El Şerqiye ya girêdayî dewleta Tirk êrişa zayendî li jinekê kir û reviya Tirkiyeyê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-bab-a-dagirkiri-ceteye-erisa-zayendi-li-jineke-kir-reviya-tirkiyeye-44600

Çavkanî:JINHA



## Malak a Xezayî ji bo di jiyanê de bimîne cilên xwe difroşe

Li Zîvala Xezayê ji ber şerê ku berdewam dike, şert û mercên jiyana mirovan her ku diçe xirab dibe, hinek zarok cilên xwe difroşin hewl didin dahata malbata xwe pêkbînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/malak-a-xezayi-ji-bo-di-jiyane-de-bimine-cilen-xwe-difrose-44619

Çavkanî:JINHA



## Jinan bersiv da desthilatdariyê

Amed a ku 8 sal e bi qayuman dihat rêveberin gel carekî din bersiva xwe li sandoqan da. AKP a ku ji roja qayum avêtiye ser bajêr dixwest rengê bajêr biguherîne, her çendî hilbijêran veguhestî be jî encama dixwest negirt.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinan-bersiv-da-desthilatdariye-44620

Çavkanî:JINHA



## Li Bismilê hevdîtina jinan

AMED - DEM Partiyê li Bismilê bi girseyî hevdîtina jinan pêk anî. Berdevka Meclîsa Jinan a DEM Partiyê Halîde Turkoglu di hevdîtinê de axivî û got: “Divê em bersivê bidin rejîma qeyûm a 8s alan, polîtîkayên şer yên desthilatdariya AKP-MHP’ê. Her mohr wê qeyûman bişîne.”

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/230726?page=2

Çavkanî:JINNEWS



## 'Sedema binpêkirina mafan tirsa li hember têkoşîna me ye'

SÊRT - Jin der barê binpêkirinên mafan ên li ser girtî û xizmên girtiyan axivîn û gotin: “Ev zext û zordarî ji tirsonekiya wan e. Sedema van binpêkirinên mafan tirsa wan a ji têkoşîn û hêza me ye.”

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/230812?page=2

Çavkanî:JINNEWS



## Çalakvanên Jin: Desthilatdar li hemberî qirkirina jinan xemsare

Her ku diçe kuştin û xwekuştina jinan zêdetir dibe, tenê di sê mehên destpêkê yên îsal de zêdetirî 15 jinan li deverên cuda yên Herêma Kurdistanê hatine kuştin yan jî neçarî xwekuştinê hatine kirin. Çalakvanên jin jî diyar dikin ku desthilat beramberî qirkirina jinan xemsare.

https://rojnews.news/ku/?p=314713

Çavkanî:ROJNEWS




## Di siya şer de ji bo çareseriya pirskirêkên civakê pêşengtî dike

Dalîa Mohammed a ku li Yemenê di bin siya şer de xwebexş xebatên alîkariya mîrovî didomîne, ji bo ku pirskirêk çareser bike carnan gel cotkar, carnan li gel xwendekarek carnan jî li gel jinan disekine.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/di-siya-ser-de-ji-bo-careseriya-pirskireken-civake-pesengti-dike-44621

Çavkanî:JINHA



## Bi hunera patîna nûbûnan diafirîne

Zîba Yunsî ya Kirmanşanî hunera patîna û çiqên din yên hunerê dike yek û berhemên balkêş derdixe holê û got: “Ez nebawerim li tu cihek din yê cîhanê ev qas cûr û lîstoka rengan hebe.”

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/bi-hunera-patina-nubunan-diafirine-44624

Çavkanî:JINHA



## 'Divê li dijî êrişa zayendî çerxa bêdengiyê bê şikandin'

Seroka Komeleya Parastina Zarok û Ciwanan a ji Tundî û Êrîşa Zayendî Fewziya Shaaban Jaber, diyar kir ku li Tûnisê li dijî êrîşa zayendî xebat dimeşînin û da zanîn divê li dijî êrîşa zayendî çerxa bêdengiyê bê şikandin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-li-diji-erisa-zayendi-cerxa-bedengiye-be-sikandin-44625

Çavkanî:JINHA



## ‘Çareserî têkoşîna hevpar a jinan e’

ÎZMÎR - Aktivîsta TJA'yê Emîne Înan diyar kir ku sedema krîza ku jin û ciwak pê re tên rû hev, tecrîd û polîtîkayên şer e. Emîneyê daxuyakirin ku çareseriya vê bi têkoşîna hevpar a jinan wê pêkan be.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/230977

Çavkanî:JINNEWS



## Evîn Buldan: Divê em zimanê kurdî biparêzin

NAVENDA NÛÇEYAN - Rojnameger Evîn Buldan, ji sekna xwe ya kurdewar û axaftina bi kurdî tu carî tawiz neda. Bi pênûsa xwe bû şopdara heqîqetê. Rêhevala Evînê Rojnameger Munevver Karademir behsa Evînê kir.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/230979

Çavkanî:JINNEWS



# Li Amedê jinek hat qetilkirin

AMED - Li Rezanê Adem Meşe, Sevda Neşe ya ku pê re li ber hevberdanê bû piştî dadgehê qetil kir.

https://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/231020

Çavkanî:JINNEWS




## ‘Ên ku bi îradeya gel têk çûn careke din serî li qeyûm didin’

Hevşaredara Sûrê Fatma Gulan Onkol û endama Meclisa Şaredariya Rezanê Jiyan Aslan, bertek nîşanî avêtina qeyûm ji bo şaredariya Wanê dan û gotin ku ên bi îradeya gel têk çûn, serî li qeyûm didin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/En-ku-bi-iradeya-gel-tek-cun-careke-din-seri-li-qeyum-didin-44668

Çavkanî:JINHA



## 'Koalîsyona Jinan li cem gelê Wanê ye!'

Koolîsyona Jinan di daxuyaniya xwe ya piştgiriyê de ji bo gelê Wanê got: “Em jin baş dizanin çawa xwedî li vîna xwe derkevin û di oxira wê de têkoşîn kirin, tê çi wateyê. Em li cem gelê Wanê ne.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/koalisyona-jinan-li-cem-gele-wane-ye-44670

Çavkanî:JINHA




## Pascal Al-Hamdanî: Yek ji rêbazên rizgariya ji bandorên şer huner e

Hunermend Pascal Al-Hamdanî, bi karakterên xêzefîlm ên ji zarokatiya xwe ve xêz dike jêhatibûna xwe keşif kir, da zanîn ku yek ji riya têkoşîna li dijî rewşên nêyînî yên ji ber şerê li Yemenê didome jî huner e.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/pascal-al-hamdani-huner-riyek-e-ku-em-bandoren-neyini-ye-ser-biskinin-44671

Çavkanî:JINHA



## ‘Guherîna zagona Statuya Şexsî pêwîstiyek lezgîn e’

Aktivîsta mafên mirovan Najia Al-Barînî diyar kir ku ji bo mafê jinan guherîna zagona Statuya Şexsî pêwîstiyek lezgîn e û da zanîn ku divê rêxistinên civaka sivîl ji bo mafên jinan bixin bin temînatê rola xwe bilîzin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/guherina-zagona-statuya-Sexsi-pewistiyek-lezgin-e-44676

Çavkanî:JINHA



## DFG: Di meha Adarê de rojnamegeran rastî tundi û êrîşê hatin

DFG'ê rapora xwe ya der barê serpêhatiyên rojnamegeran ên meha Adarê de bi raya giştî re parve kir. 6 rojnameger rastî êrîşan hatin, gihandina 153 nûçeyan hat astengkirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dfg-di-meha-adare-de-rojnamegeran-rasti-tundi-u-erise-hatin-44678

Çavkanî:JINHA



## [Weqfa Civaka Beqdarî ji bo jin bixebitin piştgiriyê dide wan](https://jinhaagency.com/ku/rojane/weqfa-civaka-beqdari-ji-bo-jin-bixebitin-pistgiriye-dide-wan-44680)

Weqfa Civaka Beqdarî ya Sûdanê, bi perwerdeyên pîşeyî piştgiriyê dide beşdariya jinan di warê aborî de, ji bo gelek jinan derfetên kar çêdike. Bi piştgiriyê armanc ew e ku jinên dixwazin projeyên xwe bixin meriyetê bi biryar bin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/weqfa-civaka-beqdari-ji-bo-jin-bixebitin-pistgiriye-dide-wan-44680

Çavkanî:JINHA



## [Kooperatîfa Kevza Bi Aqil kampanyaya hişyarkirinê da destpêkirin](https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/kooperatifa-kevza-bi-aqil-kampanyaya-hisyarkirine-da-destpekirin-44701)

Lêkolînerên jin ên Mexribê, ji bo pisporiyên xwe yên zanistî yên zêdetirê 15 salan ên têkildarî sûd û girîngiya kevza deryayê bi jinên di beşên din ên kar de dixebitin re parve bikin, kampanyayek dan destpêkirin.

https://jinhaagency.com/ku/tenduristi/kooperatifa-kevza-bi-aqil-kampanyaya-hisyarkirine-da-destpekirin-44701

Çavkanî:JINHA




# Jinên Wanê: Me li ber xwe da em bi ser ketin!

Jinan der barê serkeftina gelê Wanê de gotin ku ew ê axa xwe tu carî ji AKP û MHP'ê re nehêlin û dan zanîn ku bi serhildana li Wanê gel li îradeya xwe xwedî derketiye û encam jî serkeftineke ku di dîrokî de bibe mînak e.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-wane-me-li-ber-xwe-da-em-bi-ser-ketin-44702

Çavkanî:JINHA




# Li Edenê polîsan jinek ducanî derb kir

Li navçeya Yuregîra Edeneyê ji ber hilbijartinên muxtartiyê di navbera du koman de şer derket polîsên ku bi xaza îsotê û copan mudaxeleyî bûyerê kirin, jineke ducanî derb kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-edene-polisan-jinek-ducani-derb-kir-44707

Çavkanî:JINHA



## Rojnamevan wê îro sewqî edliyeyê bên kirin

Rojnamevan Ferhat Sezgîn, Dîlan Şîmşek û Sema Korkmaz jî di nav de herî kêm 116 kesên ku hatin binçavkirin, wê îro sewqî edliyeyê bên kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rojnamevan-we-iro-sewqi-edliyeye-ben-kirin-44710

Çavkanî:JINHA



## KCDP: Di meha Adarê de 25 jin hatin qetilkirin

Platforma Em ê Cinayetên Jinan Rawestînin (KCDP) rapora xwe ya meha Adarê weşand. Li gorî raporê, di meha Adarê de 25 jin hatin qetilkirin û 21 jin jî bi awayekî guman jiyana xwe ji dest dan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/kcdp-di-meha-adare-de-25-jin-hatin-qetilkirin-44711

Çavkanî:JINHA



## [Jinên li Misirê dixwazin peymana C190 were erêkirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-li-misire-dixwazin-peymana-c190-were-erekirin-44728)

Jinên Misirê diyar kirin ku jin di warê newekheviya zayendî di jiyana xebatê de rastî gelek binpêkirinan tên û bang kirin ku bi lezgînî peymana C190 were îmzekirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-li-misire-dixwazin-peymana-c190-were-erekirin-44728

Çavkanî:JINHA



## ‘Gotina baş û enerjiya erênî sira serkeftina min e’

Malak Nasrî ya ku bi şîrînahiyên xwe li Tûnisê bi navûdeng bû, diyar kir ku dixwaze li cîhanê bibe markayek û sira serkeftina xwe bi van gotinan vegot: "Tevî zehmetiyan jî gotina baş û enerjiya erênî sira serkeftina min e."

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/gotina-bas-u-nerjiya-ereni-sira-serkeftina-min-e-44729

Çavkanî:JINHA



## Li Suweydayê jin bi çêkirina nanê sêlê debara xwe dikin

Çêkirina nanê Ereb an jî nanê sêlê, li bajarê Suweyda yê Sûriyeyê mîrateyeke ku ji nifşan derbasî nifşan dibe û ji bo komek jinan hem ji bo serxwebûna aborî, hem jî şikandina diyardeyên civakî pîşeyek girîng e.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/li-suweydaye-jin-bi-cekirina-nane-sele-debara-xwe-dikin-44730

Çavkanî:JINHA



## Jin Bi Hev Re Bi Hêz in: Em siyaseta qeyûman qebûl nakin

Jin Bi Hev Re Bi Hêz In, bertek nîşanî mudaxeleya polîsan a li dijî çalakiya ku dixwestin bi banga "Em ji govenda li Wanê re, ji Stenbolê tevlî dibin" da û wiha got: "Em siyaseta qeyûman qebûl nakin. Em ê xwedî mafên xwe derkevin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-bi-hev-re-bi-hez-in-em-siyaseta-qeyuman-qebul-nakin-44732

Çavkanî:JINHA



**Nûçeyên herêmî**

## ‘Berxwedana me dê bi her awayê bidome’

Nûseybe Ebdo ya ji Efrînê ye û di êrişa dewleta Tirk a li ser Til Rifetê de zaroka wê jiyana xwe ji dest da dibêje ku dê bi her awayê û ruxmê hemû êrişan berxwedana xwe bidomînin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/berxwedana-me-de-bi-her-awaye-bidome-44588

Çavkanî:JINHA



## Li Til Temirê malekî bi qube ya kevin

Til Temir a girêdayî Hesekê malekî bi qube ya Asuriyan heta niha li hemberî ba û bahozê, mercên dijwar, şer û pevçûnan maye.

https://jinhaagency.com/ku/civak-jiyan/li-til-temire-maleki-bi-qube-ya-kevin-44616

Çavkanî:JINHA



## ‘Li Suweydayê di tevgera gel de beşdariya jinan bal dikşîne’

Rêvebera buroya jinan ya Hesekê ya PYD’ê Azîza Hasso diyarkir ku beşdariya jinan di tevgera gel ya Suweydayê de berdewam dike balkêş e û got: “Divê jinên Suweyda bibin xwedî hêz û îradeya Sûriyeyek demokratîk înşa bikin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-suweydaye-di-tevgera-gel-de-besdariya-jinan-bal-diksine-44622

Çavkanî:JINHA



## Jinên koçber ên Ereb ji bo 4’ê Nîsanê nêrînên xwe anîn ziman

Bi boneya rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a 75’an, jinên ku ji warên xwe koçber bûne axivîn û diyar kirin ger ji Ocalan nebûya dê rewşa wan weka yên Efganistan û Filistînê bûya.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-kocber-en-ereb-ji-bo-4-e-nisane-nerinen-xwe-anin-ziman-44666

Çavkanî:JINHA



## ‘Em ê dest ji axa xwe bernedin û rê nedin dagirkeran’

Jinên Efrîn-Şehbayê bertek nîşanî êrişên dewleta Tirk dan û diyar kirin ku de bi têkoşînê bersiva dagirkeriyê bidin û gotin ku ew ê axa xwe ji dagirkeriyê azad bikin, bi sîstema neteweya demokratîk têkoşîna xwe bi serkeftinê tacîdar bikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/em-e-dest-ji-axa-xwe-bernedin-u-re-nedin-dagirkeran-44669

Çavkanî:JINHA




## Şervanên jin ên YPJ’ê: Em bi rêwîtiya xwe serbilind in

Şervanên jin ên 11’emîn salvegera YPJ'ê pîrozkirin, wiha gotin: "Em bi rêwîtiya xwe û asta ku me gihîştin serbilind in û tevî hemû zehmetiyan jî tişta ku me destpêkiriye, hêj didomînin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Servanen-jin-en-ypj-e-em-bi-rewitiya-xwe-serbilind-in-44705

Çavkanî:JINHA



## Jinên Idlibê: Mafê me ya biryargirtinê nîne!

Jinên Idlibê, diyar kirin ku der barê jiyana wan de ne di nava malbatê û ne jî raya giştî de mafê wan a biryargirtina heye, zext û cihêkariyên rastî tên vegotin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-idlibe-mafe-me-ya-biryargirtine-nine-44706

Çavkanî:JINHA



## ‘Hevpeymana jinan dê destkeftiyên jinan misoger bike’

Hevseroka Meclisa Gelan a Kantona Cizîrê Ariya Mele Ehmed teqez kir ku armanc bi hevpeymaneke civakî ya jinan parastina destkeftiyên bi salan û çanda berxwedanê ye û got: “Hevpeymana jinan dê bibe mînak û destkeftiyên jinan misoger bike.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/hevpeymana-jinan-de-destkeftiyen-jinan-misoger-bike-44724

Çavkanî:JINHA



Kongra Star

5/4/2024